KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

DI DEVOKA SILÎVA DE BI KAR ANÎNA RENGDÊRAN

(WEKE MÎNAK ÇÎROKEKE HERÊMA SILÎVA Û GUHERTOYA DESTANA ZEMBÎLFIROŞ)

Mehmet ÇALIŞCİ

2013084

Şêwirmend

Zülküf ERGÜN

MÊRDÎN 2017

NAVEROK

NAVEROK…… 1

KURTE……..…… 6

ÖZET…….…… 7

PÊŞGOTIN……..... 8

KURTEBÊJE..... 9

DESTPÊK…… 10

BEŞA YEKEM

RENGDÊR

1. Rengdêr……...……...…….……... 13

1.1. Rengdêrên Çawaniyê..……...…….. 13

1.1.1. Rengdêrên Namdariyê…….…….……..……..... 13

1.2. Rengdêrên Diyarker..……...…….…...…..... 13

1.2.1. Rengdêrên Nîşandanê..……..….. 13

1.2.2. Rengdêrên Jimarîn……..……...…. 14

1.2.2.1. Rengdêrên Jimarîn Ên Resen…….. 14

1.2.2.2. Rengdêrên Jimarîn Ên Rêzîn…….….. 14

1.2.2.3. Rengdêrên Jimarîn Ên Dabeşiyê…….…… 14

1.2.2.4. Rengdêrên Jimarîn Ên Kesrî…… 14

1.2.3. Rengdêrên Nediyar……...…….14

1.2.4. Rengdêrên Pirsiyariyê …….…….....14

1.3. Ravekên Rengdêran.……...…….....15

1.4. Payeya Rengdêran ……15

1.4.1. Payeya Asayî.…….…….15

1.4.2. Payeya Hevrûkirinê …….…..15

1.4.3. Payeya Berz…..……..…….15

1.5. Biçûkkirina Rengdêran ……....15

1.6. Sazbûna Rengdêran……..15

1.6.1. Rengdêrên Xwerû……..15

1.6.2. Rengdêrên Darişтî…..……....16

1.6.3. Rengdêrên Hevedudanî.……...…….…….16

1.7. Rengdêrên bi Lêkera ‘’Bûn’’ê Çê Dibin…….16

BEŞA DUYEM

ÇÎROKÊN KU XEBAT LI SERÊ HATIYE KIRIN

2.1. ÇÎROKA EVÎNÊ……17

2.2. ZEMBÎLFIROŞ……...…....……..19

BEŞA SÊYEM

DI ÇÎROKAN DE NÎŞANDANA RENGDÊRAN

3.1.DI ÇÎROKA EVÎNÊ DE RENGDÊR……..25

3.1.1. Rengdêrên Çawaniyê..……..…….....25

3.1.1.1. Rengdêrên Namdariyê…….…….……...…….…..25

3.1.2. Rengdêrên Diyarker……...…….…...…...25

3.1.2.1. Rengdêrên Nîşandanê.……..…….25

3.1.2.2. Rengdêrên Jimarîn.……..……...…25

3.1.2.2.1. Rengdêrên Jimarîn Ên Resen.…….25

3.1.2.2.2. Rengdêrên Jimarîn Ên Rêzîn…….….25

3.1.2.2.3. Rengdêrên Jimarîn Ên Dabeşiyê…….…...25

3.1.2.2.4. Rengdêrên Jimarîn Ên Kesrî……..26

3.1.2.3. Rengdêrên Nediyar……...…....26

3.1.2.4. Rengdêrên Pirsiyariyê …….…….....26

3.1.3. Ravekên Rengdêran……...…..…...26

3.1.4. Payeya Rengdêran ……26

3.1.4.1. Payeya Asayî…….…….26

3.1.4.2. Payeya Hevrûkirinê …….….26

3.1.4.3. Payeya Berz…….…….26

3.1.5. Biçûkkirina Rengdêran ……..…..…26

3.1.6. Sazbûna Rengdêran……...26

3.1.6.1. Rengdêrên Xwerû……..26

3.1.6.2. Rengdêrên Darıştî…..…….…27

3.1.6.3. Rengdêrên Hevedudanî……...…….……..27

3.1.7. Rengdêrên bi Lêkera ‘’Bûn’’ê Çê Dibin……...27

3.2.DI DESTANA ZEMBÎLFIROŞ DE RENGDÊR…….28

3.2.1. Rengdêrên Çawaniyê..……..……..…28

3.2.1.1. Rengdêrên Namdariyê…….…….……..…….…..28

3.2.2. Rengdêrên Diyarker……...…….…...…....28

3.2.2.1. Rengdêrên Nîşandanê.……..…….28

3.2.2.2. Rengdêrên Jimarîn.……..……...…28

3.2.2.2.1. Rengdêrên Jimarîn Ên Resen…….….28

3.2.2.2.2. Rengdêrên Jimarîn Ên Rêzîn……..…28

3.2.2.2.3. Rengdêrên Jimarîn Ên Dabeşiyê…….…...28

3.2.2.2.4. Rengdêrên Jimarîn Ên Kesrî……..28

3.2.2.3. Rengdêrên Nediyar……...…....29

3.2.2.4. Rengdêrên Pirsiyariyê …….……....29

3.2.3. Ravekên Rengdêran……...…..….29

3.2.4. Payeya Rengdêran ……..29

3.2.4.1. Payeya Asayî…….……...29

3.2.4.2. Payeya Hevrûkirinê ……....29

3.2.4.3. Payeya Berz…….…….....29

3.2.5. Biçûkkirina Rengdêran ……...29

3.2.6. Sazbûna Rengdêran…….....29

3.2.6.1. Rengdêrên Xwerû…….....29

3.2.6.2. Rengdêrên Darişтî…..……...29

3.2.6.3. Rengdêrên Hevedudanî……...…….……....30

3.2.7. Rengdêrên bi Lêkera ‘’Bûn’’ê Çê Dibin…….....30

ENCAM…….…...31

PÊVEK…….……...…..33

ÇAVKANÎ .....…….…...….....34

KURTE

Mebesta vê xebatê di devoka Silîva de bi hemû awayên xwe ve tespîtkirina bikaranîna rengdêran e. Bi hemû awayan ve rengdêrên Kurmancî di beşa yekemîn de hatine dayîn û senifandin. Di vê xebatê de ji çavkaniyên girîng ên ku li ser rêzimana Kurmancî ne sûd hatiye wergirtin. Di beşa duyem de çîrokên ku xebat li serê hatiye kirin hatine qeydkirin û nivîsandin. Di beşa sêyem de jî rengdêrên ku di çîrokên vê xebatê de hatine bikaranîn yek bi yek hatine nîşandan û senifandin.

Bêjeyên Sereke: Kurmancî, Devok, Rengdêr, Çîrok, Silîva

ÖZET

SİLVAN AĞZINDA SIFATLARIN KULLANIMI VE SINIFLANDIRILMASI

Bu çalışmanın amacı Silvan ağzı özelinde sıfatların halk hikâyeciliği aracılığıyla yöresel ağızda şekil ve türleriyle tespit edilmesi ve sınıflandırılmasıdır. Birinci bölümde Kürtçe'deki (Kurmancî) sıfatlar bütün özellikleriyle yazılmış ve sınıflandırılmıştır. Bu çalışmada Kürtçe grameri üzerine yazılmış önemli kaynaklardan yararlanılmıştır. İkinci bölümde Silvan ağzındaki bazı hikâyeler (bir hikâye ve bir destan varyantı) kaydedilmiş ve yazılmıştır. Üçüncü bölümde ise çalışmaya konu olan sıfatların analizi, tür yönünden tespiti ile yazı dili ve yöresel ağız farklılıkları üzerinde genel değerlendirmeler yapılmıştır.

Anahtar sözcükler: Kürtçe(Kurmancî), Ağız, Sıfat, Hikâye, Silvan

PÊŞGOTIN

Mîna her zimanên cîhanê di Kurdî de jî yek ji cureyên bêjeyan rengdêr in. Rengdêr ew cure bêje ne ku ji aliyê binyadê ve û bi eslê xwe navdêr in. Ji ber ku di hevokan de bi rêya ravekan reng û dirûvên navan bi me didin nasîn bi awayê rengdêr tên binavkirin. Çawa ku di nav hemû zaravayan de cudatî heye wisa di nav devokan de jî cudatî heye û ev yek tiştekî xwezayî ye. Di vê xebata me de em ê bi gelemperî li ser rengdêrên ku di devoka Silîva de tên bikaranîn rawestin. Di vê xebatê de em li ser parastina vegotina çîrokbêj û devokê bi taybetî rawestiyan. Di destpêkê de li devera Silîva kesên navsere - yên ku di nav gel de bi çîrokbêjiya xwe tên naskirin - hatin tespîtkirin. Ji devê çîrokbêjê xwe, me du mînak ji çîrokên gelêrî tomar kir ku yek jê serpêhatiya Zembîlfiroş e, ya din jî çîrokeke gelêrî ye ku mijara wê evînî ye.

Ev xebat ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de rengdêrên ku di Kurdiya Kurmancî de tên bikaranîn ji aliyê çeşnan ve hatin nasandin. Di beşa duyem de awayê resen ên çîrokên ku ji devê çîrokbêjên me hatine tomarkirin, hatine dayîn. Di çîrokan de vegotina çîrokbêj hatiye parastin û ji aliyê me ve li ser çîrokan tu guhertin nehatiye kirin. Di beşa sêyem de rengdêrên ku di çîrokan de derbas dibin yek bi yek hatine tespîtkirin. Dawiyê jî di bin serenavên rengdêran de li ser bêjeyên ku rengdêr in dahûrîn û nirxandineke ruxsarî hatiye kirin.

Ji ber alîkariya wî spasiya xwe ji çîrokbêj û kalemêrê xas Mehmet Şerif COŞKUN re dikim.

Mêrdîn 2017

KURTEBÊJE

bnr. **:** binêrin

hwd. **:** her wekî din

r. **:** rûpel

ç. **:** çîrok

DESTPÊK

Ziman, di jiyana mirovan de hîmekî esasî ye; lewra bi rêya ziman her mirov hest, hizir, hêvî û daxwazên xwe derdixe holê. Li ser rûyê erdê bi milyaran mirov bi hezaran zimanî, jiyana xwe ya rojane didomînin. Ziman û bi kar anîna ziman mirovan ji zindiyên din vediqetîne. Di her zimanî de bi bihurîna demê re form û teşeyên cuda derdikevin meydanê. Gund bi gund, herêm bi herêm vegotinên rojane pirrî caran ji hev cuda dibin û ev yek jî dibe sedemê derketina devok û şêweyên ciyawaz ên wî zimanî. Heke erdnîgariya ku zimanek lê tê axaftin berfireh bibe wê çaxê devok jî bi demê re ji hev dûr dikevin û şêwe û zaravayên dîtir derdikevin meydanê. Bêguman ev yek bi zindîbûna ziman re têkildar e; lewra ew jî mîna her zindîyek, di nav jiyana rojane de dibe xwedî rûyek guherbar. Dem û dewran ku derbas bibin û ew ziman nebe zimanekî yekser an jî bi gotina îroyî zimanê nivîsê, ji wî zimanî bi dorê devok, şêwe û zarava derdikevin û di dawiyê de jî zarava bi awayê serbixwe zimanekî nû derdixin meydanê. Ji vê yekê re mînaka herî şênber zimanên kurdî û farisî ne ku tê zanîn ji heman kok û binyadê hatine der.

Bi girîngiya binbeşên ziman ku yek jê devok e, di sînorkirineke herêmî de, mebest ji derketina meydanê ya vê xebatê rûyekî rêzimanî yê devokê ye. Ew devoka ku bûye mijara xebata me devoka Silîva ye. Silîva yek ji bajarên herî dêrin ê erdnîgariya Kurdistanê ye. Di dîroka mirovahiyê de, di gellek çavkaniyên şaristanî yên cîhanê de gotin û serpêhatî li ser vê herêm û vî bajarî hatine qeydkirin. Bo numûne mirov berhema İbnü'l Ezrak El Farikî (Diroknasekî Farqînî (Silîvayî) ye.) ya bi navê Târîhu'l Farîkî û berhema Ewliya Çelebî ya bi navê Seyahatname dikare bide. Silîva, di serdema Bîzansiyan de bi navê Martiropolîs, Metropolîs[1]; piştî berbelavbûna dînê Îslamê û misilmanbûna kurdan, di bin bandora zimanê erebî de ku serdemeke dûr û dirêj bûbû zimanê perwerde û îdareya sîyasî ya li herêmê, bi navlêkirina erebî, bi awayê Meyafarqîn[2] hatiye binavkirin. Niha li derdora bajarê Silîva, wekî mînak li Batman, Mûş, Diyarbekir û Sêrtê ji bo navlêkirina bajar Silîva tê gotin. Lê di nav bajêr de, ji aliyê şêniyên bajêr ve navê bajêr bi awayê Farqîn tê bikaranîn. Lewra navlêkirina Farqînê ji çavkaniyên dîrokî tê fêmkirin ku ji aliyê ereban ve ye. Silîva ji aliyê îdareya sîyasî ve jî di dîroka Kurdan de ciyekî girîng digire. Lewra ji sed salî zêdetir Kurd li vî

[1] Yrd. Doç. Dr. Güner SAĞIR, '' Bizans İmparatorluğu Döneminde Anadoluda Ermeni Yerleşimleri'', İstanbul, 2007, r.184.
[2] "Silvan", Ana Britannica-XIX, Ana Yayıncılık, İstanbul, 1990, r. 380.

bajarî dewleta Merwanîyan bi rê ve birin û ev yek jî form, teşe û rûyekî îdarî da jiyana rojane. Silîva ji aliyê devoka xwe ve jî di gellek çavkaniyan de gotinê haniye ser xwe. Di Seyahetname ya Ewlîya Çelebî de, li ser devoka Silîva mînakên hejmaran û hin hevokên rojane hatine tomarkirin.[3] Ev yek jî vê rastiyê derdixe holê ku devoka Silîva devokeke serbixwe ye.

Di vê xebata me de, em li ser devoka Silîva, bes di çarçoveya hîmeke rêzimanî de rawestiyan ku ew jî rengdêr in. Rengdêr ew cure bêje ne ku ji aliyê reng, dirûv û teşeyî ve navan didin nasîn. Her çi qas ji aliyê binyadî ve nav bin jî, di ravek û hevokan de ji ber ku ji aliyê taybetmendiyên navxweyî ve navekî din bi me didin nasîn, ji wan re tê gotin rengdêr. Di kurdî de gellek form û awayên bikaranîna rengdêran hene. Di beşa yekem de me bi berfirehî behsa taybetmendiyên rengdêran kir. Xebata me di naveroka du çîrokan de tespîtkirina rengdêr û bi kar anîna wan a li herêma Silîva ye. Çîrokên ku bûne mijara xebata me, ji aliyê çîrokbêjekî Silîvî ve hatiye vegotin, bi devkî hatiye tomarkirin û dû re hatiye nivîsîn. Xebat ji du çîrokan pêk tê. Çîroka Evînê 06.29 xulek, varyanta Destana Zembîlfiroş jî 17.15 xulek didome. Astengiya herî mezin a li ber vê xebatê peydenebûna çîrokbêjan bû. Kesên ku digotin em çîrokan dizanin jî, bi awayê nîvçe û ji hunera vegotina çîrokê dûr bûn. Tiştê manîdar jî ew bû ku çîrokbêjê me û malbata wî bi rêya derwêşiyê ji mêj ve hatine û li Silîva bi cî bûne. Bivênevê çanda derwêşiyê li ser vegotina wî xuya ye.

Çîrok li Silîva têne vegotin. Xebata me her çendî li ser rengdêran be jî bi gelemperî bandora Tirkî, Erebî û ola İslamê ya li ser Kurmanciya Farqîniyan jî derdixe pêşberî mirov. Çîrokbêj Mehmet Şerif COŞKUN e. 75 salî ye. Ne xwende ye û çîrokan ji dayika xwe û hin çîrokbêjên Başûrê Kurdistan'ê guhdarî kiriye. Çîrokbêjê me, li Taxa Tekela Kevn ya Silîva dijî, li ber Mizgefta Selaheddînê Eyyûbî ku di nav şêniyên bajêr de bi awayê Camiya Ecem tê nasîn, pirtûkfiroşiyê dike û heta qedana rojê ji kesê der û dorê xwe re çîrok û meselokan vedibêje û carinan jî dengbêjiyê dike. Me ev xebat li mala çîrokbêje xwe, bi rêya telefonê tomar kir û bi wêneyan jî şênber kir. Çîrok ji aliyê maweyê ve bi giştî ji 23,44 xulekan pêk tê. Ev xebat di 2014an de hatiye kirin. Berhevok ji serpêhatiya Zembîlfiroş û çîrokeke evînî pêk tê. Di berdewama xebatê te em yek bi yek li ser rengdêran sekinîn û me taybetmendiyên wan destnîşan kir.

[3] Evliya Çelebi, Evliya Çelebi Seyahatnamesi, Sad. Tevfik Temelkuran - Necati Aktaş, Üçdal Neşriyat, İstanbul, 1986, Cilt:3/4, r.474.

Piştre cudatî û ciyawaziya bikaranîna rengdêrên devoka Silîva ji aliyê me ve hatin tespîtkirin û li ser wan hin nirx û şîrove hatin kirin.

BEŞA YEKEM

1.RENGDÊR

Rengdêr; rengê, şiklê navdêran û hejmara wan diyar dikin.[4] Celadet Alî Bedirxan rengdêr bi kar aniye; lê hinek zimanzan peyva "hevalnav"ê bi kar tînin.[5] Lê em ê di vê xebatê de bêjeya rengdêr bi kar bînin. Rengdêr, li gor wateya xwe dibin du beş: Rengdêrên çawaniyê û rengdêrên diyarker.

1.1.RENGDÊRÊN ÇAWANIYÊ

Rewşa navdêran ji aliyê şiklî, rengî û rewşê ve terîf dikin.

Mînak: kesk, rizî, çavbelek, stûr, bilind

Pirtûka baş, Pêlava sor , dara bilind

1.1.1.Rengdêrên Namdariyê

Ev rengdêr ji rengdêrên çawaniyê ne. Asta civakî ya navên taybet nîşan didin.[6]

Mînak: Mam Celal, Bijîjk Neslîxan, Îskenderê Mezin, Reshardê Kezebşêr

1.2. RENGDÊRÊN DIYARKER

Ev rengdêr; navdêran ji aliyê pirsê, nediyariyê, nîşandanê, û hejmarê didine xuya kirin.

1.2.1.Rengdêrên Nîşandanê

Gava cînavkên nîşaniyê têne beriya navdêrekê û wê îşaret dikin, dibin rengdêrên nîşaniyê.[7]

Rengdêra nîşaniyê ya "ev" navdêrên nêzîk, rengdêra nîşaniyê ya "ew" navdêrên dûr nîşan dide.[8] Formên van rengdêran yên xwerû û tewandî hene.[9]

Xwerû: Ev pirtûk ya te ye. Ew pênûs ya min e.

Tewandî: Vî hevalî/ vê hevalê tu nas dikî. /Wê zebeşê/ wê kêrê bikire.

---

[4] Abdullah İncekan, Ez Kurdî Hîndibim- Pratik Kürtçe Dersleri, Nûbihar, Stenbol, 2010, r.53.
[5] Sami Tan, Rêzimana Kurmancî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2011, r.159.
[6] Mikail Bülbül & Bahoz Baran, Rêzimana Kurmancî, Enstûtuya Kurdî ya Amedê, Amed, 2008, r.42.
[7] Çetin Taş, Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî, Dîwan, Stenbol, 2013, r.98.
[8] Tan, r.170.
[9] Prof. Dr. Kadri Yıldırım, Kürtçe Dil Bilgisi, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin, 2012, r.257.

1.2.2. Rengdêrên Jimarîn

Ev hevalnav navan lî gorî mêjerê diyar dikin.[10]

Ev rengdêr dibin çar beş:

1.2.2.1.Rengdêrên Jimarîn ên Resen

Hejmara navdêran nîşan dike.

Mînak: Heft cam şikestin ji ber roniya rûyê wê.
Sî û sê Gule, Pênc heller jî ji bo te pîra qenc.

1.2.2.2. Rengdêrên Jimarîn ên Rêzîn

Rêza navdêran nîşan didin. Bi qertafên parkît yên –an, ,em, -em-în çê dibin, piştî navdêran tên.[11]

Mînak: Bahara duyemîn dijî emrê min. Pirsa yekem

1.2.2.3. Rengdêrên Jimarîn ên Dabeşiyê

Parvekirina navdêran diyar dikin.[12]

Mînak: Refên çar çar, gulîyên şeş bi şeş

1.2.2.4. Rengdêrên Jimarîn ên Kesrî

Mînak: Çaryek zêr diyarî kir. Nîv nan xwar.

1.2.3.Rengdêrên Nediyar

Cînavkên nediyar gava tên beriya navdêran dibin rengdêrên nediyar.[13]

Minak: Min gelek helbest nîvîsîn. Tu hin pirtûkan bide min. Hemû tişt keda te ye.

1.2.4. Rengdêrên Pirsiyariyê

Ev rengdêr ji navdêran dipirsin. Bersiva wan dîsa rengdêr in.[14]

Mînak: Çavên te çend şev dikin, lêvên te çend qerenfîl. Kîjan pol bû yekemîn.

[10] Yıldırım, (h.b), r.260.
[11] Kamuran Bedirxan, Kolay Kürtçe, Doz Yayınları, İstanbul, 2000, r.125.
[12] Bülbül&Baran, (h.b), r.43.
[13] Tan, (h.b), r.175.
[14] Bülbül&Baran, (h.b), r.44.

1.3.Ravekên Rengdêran

Rengdêr di ravekan de rewşa raveberê diyar dikin.[15]

Mînak: Sêva sor, xaniyê spî û mezin, yara gerdenzer, kartolên qelandî

1.4.Payeya Rengdêran

Paye, asta navdêran û rewşa wan li hemberê navdêrên din nîşan didin. Bi payeya asayî, payeya hevrûkirinê û payeya berztir dibin sê beş.[16]

1.4.1.Payeya Asayî

Rengdêr qertafan nastîne lê wateyê xurt dike.

Mînak: hevalê baş, mezela fireh, Ev av sar e. Ew xort jîr e.

1.4.2.Payeya Hevrûkirinê

Di van payeyan de hokerên bi qasî, hindî hew, wekî hew; an jî qertafa parkît ya "-tir" tê çê kirin.

Mînak: Bi qasî te zîrek e. Mala mezintir ev e. Helbest ji romanê xweştir e.

1.4.3.Payeya Berz

Bi hokera "herî" û qertafa parkît ya "-tirin"ê tê çê kirin.

Mînak: Hingivê herî xweş yê Serdeştê ye. Bajarê germtirîn Amed e.

1.5.Biçûkkirina Rengdêran

Parkîtên –ik,-ok,-ek,-kok tên daviya rengdêran û wateya biçûkirinê didinê.[17]

Mînak: Keça zerik,

1.6.Sazbûna Rengdêran

Rengdêr li gorî sazbûna xwe , (xwerû, darîştî, hevedûdanî) sê beş in.[18]

1.6.1. Rengdêrên Xwerû

Ev rengdêr kok in, qertaf nestandîne.

---

[15] Bülbül&Baran, (h.b), r.44.
[16] Tan, (h.b), r.257.
[17] Celadet Ali Bedirxan & Roger Lescot, Kürtçe Gramer, Avesta Yayınları, İstanbul 2009, r.214.
[18] Yıldırım, (h.b), r.248.

Mînak: Hespê baş, zozanên xweş, dara bilind

1.6.2. Rengdêrên Darîştî

Ev rengdêr bi parkît û pêrkîtan çê dibin.

Mînak: Axayê zordar, lawikê xemgîn, hevalê bêbext, kesê bêbawer

1.6.3. Rengdêrên Hevedudanî

Ev rengdêr herî kêm du bêjeyan hatine çê kirin.

Mînak: yara xem-revîn, Reşhardê Kezeb-şêr, bajarê xwîn-mij, gurê çav-sor

1.7. Rengdêrên bi Lêkera 'Bûn'ê Çê Dibin

Rengdêr di rola pêveberê de digel pêwendiya lêkera bûnê beşeke pêvebera navdêran e.[19]

Mînak. Bajar kevn e. Dawet nerm e. Mirovek xêrxwaz bû.

[19] Qanatê Kurdo, Rêzimana Kurdî – Kurmancî - Soranî, Nûbihar, Stenbol, 2013, r.100.

BEŞA DUYEM

ÇÎROKÊN KU XEBAT LI SERÊ HATIYE KIRIN

2.1.ÇÎROKA EVÎNÊ

Farqîn şehreke pirr kevn bûye û tê de evîn pirr çêbûye. Divê xortekî hebû çax û bengê xu da bû. Rojekî ji memleket derket hate Farqînê. Di nava şehrê Farqînê da, di nava sûka Farqînê da gava ku geriya bala xwe dayê qîzekî ji wir de tê. Ne kin e ne dirêj e. Orte boylî ye, pirr xweşik e. Gava ku lê mêze kir pirr begem kir. Pirs û sual kir. Go eceba mala bavê vê qîzikê li ku derê ye? Vir da pirs kir wir da pirs kir go mala bavê vê qîzika hanêka eynî li dû koşka mala Sadiq Beg û Miherem Beg hebû jê wir de li serê sûrê ye. Gava ku qesta wê derê kir, bala xwe dayê xanîkî du qat e. Qatekî li ser qatekî ye. Lakîn qata binî weke bodrom e, qata dinêka jî weke odekî ye. Go, ya rebbî tu nusretê bidî. Çend neqil çû pirs û sual kir, evana riya mala xwe nedanê. Li ser viya jî bû hisret, bû derd bû êş bû elem. Sekinî, li serê tefekkir bû. Go, ya rebbî min digot qey ew ê qedera min li serê vê qîza hanêka be. Demekkî eviya qedera xweda ye. Belkî qedera min ne li serê be. Tê de derbas bu, sal û zeman çû. Rojekî dîsa di ber mala bavê wî da derbas bû, bala xwe dayê wê qîza ku wî dîtiye û ewqas pirs û sual kiriye îca vê qîza hanêka mezin bûye, hatiye kewna xwe. Qesta wê kir çû cem bavê wî. Ji bavê wî ra got. Selamun aleykum, go, aleykum selam. Go, ez dixwazim bi emrê xwedê û resûle xwedê tu vê qîza xwe bidî min. Go, min qebûl e, lê diya qîzikê qebûl nekir. Diya qîzikê firtûne çêkir li ser vî gêncê hanêka. Evî gêncê hanêka jî rabû di halê xwe da şewitî. Go, ya rebbî ev qedera min çima wiha çêbûye? Bû weka mecrû, ma weka dîna. Di nava Farqînê da çû hat… Rojkî derbas bû yek li berê sekinî. Ey bimbareko! Tu ewqas ji vî halê xwe derketî, ketî halekî dinêka çima wiha bûye? Go, wellahîn qîzeki li vir hebûye û dilê min jî tê da ye û ez dikim nakim evê qîza hanêka nadine min. Go, xwedê mala te avake! Here cem mala xalê wî. Gava tu herî cem mala xalê wî nabêje na. Eviya rabû. Bawer nekir ku kîngê bive êvar. Qesta mala xalê wî kir. Req req li derî xist, selam kir. Keremke birawo, tu ji ku derê yî? Go, welle ez merivekî zewallî me ji xu ra hemaltiyê dikim filan û bêvan… Ê xer be? Go, wellehîn qîzekî li serê sûrê heye, ji mala Miherem Begê vir de ye. Awê ku min pirs û sual kiriye dibê qîza xwişka te ye û bavê wî dibê erê lê lakîn diya wî dibêje na. Min jî xu avêtiye ber tor û bextê te. Tu ji mi ra çarekî bibînî. Li wê derê pîrekî rûniştî bû. Pîrê, awakî destê xu li hev bir û anî, şeq şeq kir. Go, ha birako! Go, ha. Tu ji mi ra kîlokî helawa Mêrdinê bistînî ez ê wisa bikim ku wê qîzikê

bidine te. Evî xortê hanêka, hemal awa lê fetili go, pîrê eger ku tu dil bikî kîloki helaw na go, bi şeref ez ê tenekekî helaw ji te ra bistînim. Ê go, de here sibê na dusibê ew ê bayram çê bibe. Ew ê werine vê derê. Tu jî were vira ez ê îşê te temamî hel bikim. Eviya rabû qesta malê kir û bi kêf û bi zewq û bisefa… Pîrê dilê wî gelkî xweş kiriye. Du rojê wî nizam bi çi newayî qediya. Gava ku berê xwe da wê derê û çû, bala xwe dayê pîrê wa yê li ser kursî rûniştiye û bavê qîzikê û diya qîzikê û tevî qîzikê hatin ketine hundir. Gava ku qîzik çav bi vî lawikê ket bi heyecan kete oda paşîn. Diya qîzikê go, eviya çiye? Eviya hatiye vê derê? Em ji jorê ji bela viya nefilitîn îca viya ji kur da vê riya hanêka dîtiye hatiye vê derê? Li wê derê rûnişt. Weka hêsir, pepûk û evdala sekiniye, destê wî li ser hev û dinêka ye, çavê wî li dev û diranê pîre ye ku pîre jê ra tiştekî hel bike. Pîrê ewha fetilî, xu bir û anî, deng li diya qîzikê kir go, mala bavê te neşewitiyê! Ma qey tê qîza xwe bidî yekî ji viya çêtir? Go, mêrik merivekî çalişqan e, dişixule, ji sibê heta êvarê îdara xu dike. Bi xwedê ew ê te jî xwedîke, mêrê te jî xwedîke û ew ê qîza te jî xwedîke. Ê go, tu ana çi dibêji? Go, welle hima qîzikê em ê bidinê. Bavê qîzikê jî dilê wî heye û xalê qîzikê jî dilê wî heye. Lakîn maye li ser diya qîzikê. Dilê diya qîzikê tune ye. Pîrê ewha fetlanokekî da û pufî ser çavê wî kir, hinek tûk li ser çavê wî ket neket… Paqij kir û li wê derê rabûn qîza xwe dane wî. Ew çûn ser meqsed û miradê xu, şa bûn. Em jî bi îman û qur'anê…

2.2. ZEMBÎLFIROŞ

Zembîlfiroş kurê mîrê hekariyan bûye. Dewamlî karê wî seyd û neçîr bûye. Gava ku seyd û nêçîr kiriye sadece li dû xezal û pezkoviya geriyaye. Wisa ku nêşelî bûye û di hekariyan de jî hukmê wî hebûye. Tabî kurê mîr bûye. Her mîrekî jî zarokê wî parîkî hikûmdar bûye. Xulam û xizmetkar pê re çûne nêçîrê. Gava ku ji seydê fetiliye bala xwe dayê rastekî weka deştê. Siwarê hespekî şînbozî, pûlpûlî bûye û kêfa wî hatiye. Di wê rastê da hespê xwe ajotiye. Gava ku hespê xwe ajotiye piyê hespê wî di erdê da çûye xorê. Heyecanekî pirr mezin girtiye. Ji wî heyecanê xwîdan di eniya wî da avêtiye. Tesîreke pirr mezîn li ser pişta hespê çêbûye li serê, li wê derê sekiniye. Gazî xulam û xizmetkarê xu kiriye. Gotin, vira bikolin. Di vir de yan xezîneyeke pirr mezin heye yan ecêbeke pirr mezin ji vê derê derketiye. Gava ku wê derê kolan û mêzê kirin bala xwe danê meqberkî ku em jê re dibêjin mezel. Mezelekî tê de derketiye. Du kêlik li ser wî mezelê bûye. Li ser van kêlika nivîsandiye, eger yaziya wî çaxê bi çi newayî be… Gava ku xwendiye pirr sal û zeman derbasbûye. Gava ku devê wî mezelê vekirine bala xwe danê ku kefenê wî hê tiştekî pê nebûye, di eniya wî da jî zipik zipik xwîdan avêtiye. Weka ku teze rehmet kiriye, wî teze veşartine, wî xistine mezel bi wî newayî ku sekinandiye. Bi wî newayî heyecan wî digire, ta lê çêdibe. Berê xwe dide malê. Gava ku berê xwe dide malê bavê wî, diya wî dikevine heyecanê. Di wê heyecanê da evana radibin gazî dixtor û hekîm dikin. Gazî hekîmê lokman dikin. Gava ku têne serê, bala xwe didinê. Hekîm ji wan ra dibêje. Tesîra ku ez ê îlacekî bidime viya ew ê baş bibe ew tesîr li serê nîn e. Tesîrekî dinêka ye. Eviya tişkî j imin dûr e. Radibin çawa dikin? Gazî şêx û mela dikin. Gava ku şêx û mela tên temamekî di wê heyecanê da kîtabê xwe datînin, li serê disekinin, mutale dikin. Dikin nakin çarekî ku ew ê jê ra bibînin tune ye. Mutale pirr li ser kîtaba dikin. Dia dixwînin, ayata dinivîsînin, çaresiz e. Dibê ew roj du heb baba dewrêş dibine mêvanê mîr. Mîr dibêje ez ji van baba dewrêşa jî sual bikim. Baba dewrêş li dinyayê digerin pirr zana ne. Ê ji berê da gotiye:’’Rovîkî geriyayî ji şêrekî sekinandî çêtir e.’’Însanekî ku li dinyayê bigere bi her tiştî zane. Ji wan sual dikin wan her dû baba dewrêşa dîbên:’’Însanekî gava ku bi keda helal, bi xwîdana eniya xu bişixule û emegê bike ew çiqas sal di binê êrdê da be jî ji cesedê wî tiştekî nabe, kefenê wî jî tu tiştekî pê nabe. Ew gav Zembîlfiroş heyecan digire. Zembîlfiroş radibe misada xu ji diya xu û bavê xu dixwaze. Çolix û çocixê xu hiltîne… Dibê encax bi tilî û pêçîkên xu ez îş bikim ku ez xu misteheq bikim. Ji Hekariyan serbejêr tê Wanê. Midekî li Wanê disekine. Di halê xewê da berê wî dikeve Tetwanê. Gava ku berê wî dikeve Tetwanê li

Tetwanê jî hinek selikên, zembîlên xweşik çêdike. Li wê derê radibe, di wî halê xewê da… Dibên, gava tu bikevî geliyê Bedlîsê:’’Tê de du heb welî ne. Yek Şêx Şabedîn yek Seyîd Elî ye.’’Piştî ku tu ji Bedlîsê derbas bibî qezakî heye navê wî Baykan jê ra dibêjin. Jê wir da Hezretî Weysel Qeranî heye. Destbirakê Hezretî Mihemed e. Belkî rebulalemîn şîfakî xweş ji te ra bişîne. Selikê te jî bol bol herin. Gava ku tê Weysel Qeranî zîyaret dike, li wê derê sebr û tebata wî nayê berê xu dide şehrê Kozlixê. Kurê Rewal ku dibêjin li wê derê ye. Ew jî tesîrekî pirr mezin li wir dibîne. Berê wî dikeve Êlihê. Êlih rastekî bûye. Tê da şehr û filan û bêvan tune bûye. Lakîn li serê gir du mal sê mal sekinandî bûye. Qesta wan mala dike. Diçe, rojekî du roj ku li wê derê disekine berê wî dikeve Farqînê. Tê Farqînê. Çemê Farqînê jî meşhûr bûye. Di ber vî çemî da jî zembîlê xu tam çêdike û berê xu dide Farqînê. Êêêê çem jî nêzîk bûye jê ra. Gava ku tê Farqînê li serê kuçekî holikekî çêdike. Di holikê da disekine. Roj û zemanê xu derbas dike. Rojekî yek jê ra dibêje. Dibê, van selikê wiha xweşik ku tu çêdikî tu çima naçî sûka Mala Mîra? Tu herî wê sûkê li wê derê Mala Mîra gava van selikê te bibînin ew ê pirr begem bikin, ew ê pirr jî ji te bistînin. Ew jî radibe deh, pazdeh selik dibe sûka Mala Mîra. Gava ku tê jina mîr li banê birca belek di pencereyê da mêze dike. Bala xu didê yekî zembîl di milê wî da ne ji wir da hat. Lê ewha mêze dike, bi dilekî na bi hezar dila aşiq dibe. Li ser wê eşqê gazî qewraşa xu dike. Dibê, ey qewraş! Xu bilezîne, xu bigihîne wî zembîlfiroşî wî bîne were. Gava ku qewraş diçe ji Zembîlfiroş ra dibê were xanima min gazî te dike Zembîlfiroş qesta mala mîr dike û dikeve hewşê. Xatûn ji jor da pêplûk pêplûk tê xorê û mîsalekî jê ra dibêje.

Dibê:

‘’Ey Zembîlfiroş, kerem ke pêş e

Qîmeta selikê xu bêje

Yê mezin buha bibêje

Yê piçûk zêran bikêşe

Kerem ke ser meslehetê

Ku ez û te bi hev ra herine cinnetê

Dûr e roja qiyametê.’’

Zembîlfiroş gava ku lê mêze dike, bala xu didê halê xatûnê halekî xerab e. Ey xatûn, dibê:

‘’Qîmeta zembîlê min tunîne

Ez tobedar im

Tobedarê rebbê cebbar im

Wellahî ez ji rebbê xu nikarim.’’

Xatûn dîsa dibêje. Li ser Zembîlfiroş difetile:

‘’Ey Zembîlfiroş

Lawikê dewrêş e

Kerem ke were pêş e

Qîmeta selikê xu bêje

Yê mezin buha bibêje

Yê piçûk zêran bikêşe

Kerem ke ser meslehetê

Dûr e qiyamet’’

Zembîlfiroş dibê:

Ey xatûnê

‘’Topa xweda li qaf ketê

Te ez birim helaketê

Tirsa min ew e ji şahê qudretê’’

Xatûn dibê:

‘’Ey Zembîlfiroş

Kerem ke şûna mîr e

Bikişîne qelûna mîr e

Li mîr heram be

Li te helal be

Kerem ke ser meslehetê

Ku ez û te bi hev ra herine cinnetê’’

Zembîlfiroş dibê:

‘’Ey xatûnê

Ez tobedar im

Tobedarê rebbê cebbar im

Ez ji rebbê xu nikarim’’

Xatûn dibê:

‘’Ey Zembîlfiroş

Lawikê ebbas e

Bi tena derpê û kiras e

Ez qesem bikim ji zatê rebbulalemîn tu bikî nekî tu îro ji vî destî nabî xelas e.’’

Gava ku wisa dibêje, xatûn çav li qewraşê dişikîne. Qewraş her çar qapî lê girtîye. Rêya revê ji Zembîlfiroş ra nehiştiye. Zembîlfiroş mecbûr ma sitûyê xu xor kir, misînekî av ji xatûne xwestiye. Berê xu da şûna destavê ku rêya revê ji xu ra bibîne. Bala xu dayê rêkî diçe ser bircê bilind. Di wir da kişiya. Li ser bircê bilind sekinandiye. Birca bilind hezar û pênc sed rim bûye. Zembîlfiroş li asîman mêze kiriye. Heyecan Zembîlfiroş girtiye. Go, ya rebbê min. Min li ber destê te tobe kiriye. Ez ê xu ji ser birca belek bavêjim xwarê zar û zêç û mal temamî teslîmê te. Xwe ji ser bircê avêt xorê. Rebbulalemîn ferman kiriye:

‘’Ey cebraîl teyrê sivik

Xu bigîne wî evdê bêşik

Deyne erdekî nermik

Bira neêşê’’

Zembîlfiroş qesta mala xu kiriye. Gava ku li erdê ket tiştekî pê nehatiye. Bi alî malê da ku çûye, zarok û jina wî hatine pêşiyê, pê ra zembîla nedîtine, pirr kêfa wan tê. Dibên qey Zembîlfiroş zembîla firotiye. Go, ey Zembîlfiroş. Kanê heqê zembîlê delalî?

Zembîlfiroş go:

‘’Xatûn zembîl ji min sendî bi zor

Lakîn min wî spartiye rebbê li jor’’

Pîreka Zembîlfiroş go:

— Ey Zembîlfiroş zarok hem tî ne hem birçî ne.

Go, ey hurmet

‘’Tendûr dade bi sarî ye

Heta zarok di xew da çûye.’’

Xanima wî zend û benda hilaniye. Hijika avêt tendûrê. Tendûrê pêxistiye, hetanî ku zarok di xew da çûye. Gava ku devê tendûrê vekiriye bala xu dayê di tendûrê da bêhna teamê cinnetê alav daye. Go, bixwin ku hetanî qiyamet çêbûye. Gava ku Zembîlfiroş û zar û zêç ji wî teamî xwarine pirr kêfa wan hatiye. Em wan li wê derê bihêlin bên ser xatûnê û qewraşa wê. Xatûne heyecan girtiye. Weke însanekî ku dîn bûye, aqilê xu wenda kiriye. Hiş û aqil li serê xatûnê nemaye. Farqîn jê ra wek gundekî bûye. Pirsî. Go:

—Mala Zembîlfiroş li ku ye?

Qewraşê go:

—Li serê goşe holika xu çêkiriye.

Rabû xu xemiland, bi şeş sed û şêst û şeş awaziye. Qesta ba jina Zembîlfiroş kiriye. Bi jina Zembîlfiroş ra xeber daye:

—Ya jina Zembîlfiroş! Çiqas xişirê min, zêrê min, zîvê min, cilê min hene ez ê bidime te. Tê jî wan cilê xu bidî min.

Jina Zembîlfiroş xapandiye. Cila jê sendiye. Çiqas xişirê wê hebe dayê. Bi îrada rebbê alemîn xilxalê di lingê xu da ji bîr kiriye. Bû êvar. Şev e, şev tarî ye. Xatûn rabû qesta Zembîlfiroş kir. Xu di kêleka Zembîlfiroş da dirêj kiriye. Zembîlfiroş hembêz kiriye. Zembîlfiroş ku ji teamê cinnetê xoriye ji wî tirê ku helala wî ye. Dest avêt sitûyê wê. Destê xu berjêr anî. Destê wî li xilxalê ket. Ew gav zanibû ku xatûn e.Zembîlfiroş ji nava ciyan revîya. Xatûn daye dû. Kir nekir tebata wî ji destê xatûnê tuneye. Çemê Farqînê çemeke mezin bûye. A niha navê çemê Batmanê lê danîne. Zembîlfiroş di çem de derbas bûye. Bala xu dayê ku xatûn li dû wî ye. Eşqê wisa xatûn girtiye, tebata Zembîlfiroş ji destê xatûnê tune bûye. Çû binê Qozlix li darê rewal sekinandiye. Ku darê rewal li biniya darê gûz bûye. Zembîlfiroş wisa zend kir ku xelasbûna wî ji destê xatûnê tune bûye. Go:

—Ya rebbî, tu bi hurmet û celaleta navê xu kî tu ruhê min li vê derê bistînî. Tu min bi destê xatûnê ra bernedî.

Bi îrada rebbulalemîn Zembîlfiroş li wê derê rehmet kiriye. Xatûn çû ser cesedê wî, bala xu dayê. Eşqê li xatûn xistiye. Weka dîna hiş û aqil di serê wê da nemaye. Bi her dû desta porê xu girtiye, li nava çavê xu xistiye. Li ser Zembîlfiroş mîsalekî gotiye:

—Ey Zembîlfiroş, ez aşiqê bejn û bala te nebûme. Ez aşiqê wî nûra xweda bûm ku rebbulalemîn wê nûrê di eniya te da daniye. Ez nizanim çi dia bikim.

Pirî ku giriyaye di şuna stêrkê wê da xûn hatiye, dar û nebat hêşîn bûye. Serê xu bilind kiriye li asîmana mêze kiriye. Go:

—Ya rebbî, ew diayê ku Zembîlfiroş ji te kiriye û te jî jê ra qebûl kiriye wan dia tu ji min ra jî qebûl bikî, ruhê min li vê derê bistînî li kêleka Zembîlfiroş bi eynî ye.

Ew li vê dinyayê negihîştine meqseda xu li wê dinyayê xwedê teala me û wan û hazira ef û mexfîret bike…

BEŞA SÊYEM

3. DI ÇÎROKAN DE NÎŞANDANA RENGDÊRAN

3.1.DI ÇÎROKA EVÎNÊ DE RENGDÊR

3.1.1. Rengdêrên Çawaniyê

şehreke pir kevn, pir xweşik, merivekî zewallî, merivekî çalişqan,

Hişyarî: Peyvên mîna zewallî, çalişqan her çiqas peyvên Tirkî bin û bandora Tirkî derxin holê jî bi eslê xwe ew jî rengdêr in.

3.1.1.1. Rengdêrên Namdariyê

Hişyarî: ‘’beg’’ bi eslê xwe rengdêrê namdariyê ye lê li vir wek navdêr hatiye bikaranîn.

Bnr: Miherem Beg

3.1.2. Rengdêrên Diyarker

3.1.2.1. Rengdêrên Nîşandanê

vê qîzikê, qîza hanêka, gêncê hanêka, vî halê, wê derê, wê qîzikê, evî xortê

Hişyarî: ‘’hanêka’’ di wateya ev û wê de hatiye bikaranîn.

3.1.2.2. Rengdêrên Jimarîn

3.1.2.2.1. Rengdêrên Jimarîn Ên Resen

xanîkî du qat, kîlokî helawa Mêrdînê, kîlokî helaw, tenekekî helaw, du rojê wî

3.1.2.2.1.2. Rengdêrên Jimarîn Ên Rêzîn

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.1.2.2.1.3. Rengdêrên Jimarîn Ên Dabeşiyê

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.1.2.2.1.4. Rengdêrên Jimarîn Ên Kesrî

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.1.2.3. Rengdêrên Nediyar

hinek tûk, çend neqil, gelkî xweş

3.1.2.4. Rengdêrên Pirsiyariyê

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.1.3. Ravekên Rengdêran

xanîkî du qat, merivekî zewallî, şehreke pirr kevn

3.1.4. Payeya Rengdêran

3.1.4.1. Payeya Asayî

merivekî çalişqan e.

3.1.4.2. Payeya Hevrûkirinê

yekî ji viya çêtir

3.1.4.3. Payeya Berz

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.1.5. Biçûkkirina Rengdêran

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.1.6. Sazbûna Rengdêran

3.1.6.1. Rengdêrên Xwerû

kevn, çalişqan, zewallî, hêsîr, pepûk, evdal

Hişyarî: hêsîr, pepûk, evdal bi eslê xwe rengdêr in lê li vir weke navdêr hatine bikaranîn.

Bnr: (Weka hêsîr, pepûk û evdala sekiniye.)

3.1.6.2. Rengdêrên Darişti

Xweş-ik

3.1.6.3. Rengdêrên Hevedudanî

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.1.7. Rengdêrên Bi Lêkera ‘’Bûn’’ê Çê Dibin

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.2.DI DESTANA ZEMBÎLFIROŞ DE RENGDÊR

3.2.1. Rengdêrên Çawaniyê

bircê bilind, rastekî weka deştê, heyecanekî pir mezin, ecêbeke pir mezin, hespekî şînbozî, hespekî pûlpûlî, zipik zipik xwîdan, tesîreke dinêka, pir zana, keda helal, halê xewê, hinek selikên xweşik, xezîneyeke pir mezin, hinek zembîlên xweşik, şîfakî xweş, teyrê sivik, evdê bêşik, erdekî nermik, çemeke mezin, halekî xerab, tişkî ji min dûr, rovîkî geriyayî, şêrekî sekinandî

3.2.1.1. Rengdêrên Namdariyê

Şêx Şabedîn, Hezretî Weysel Qeranî, Baba Dewrêş

3.2.2. Rengdêrên Diyarker

3.2.2.1. Rengdêrên Nîşandanê

wê rastê, wê derê, van kêlika, wî mezelê, wî çaxê, wî newayî, vî çemî, ew tesîr, wî zembîlfiroşî, vî destî, ew gav, vê /wê dinyayê, wan mala, wan haziran, van baba dewrêşan

3.2.2.2. Rengdêrên Jimarîn

3.2.2.2.1. Rengdêrên Jimarîn Ên Resen

du kêlik, du heb baba dewrêş, yek Seyîd Elî, yek Şêx Şabedîn, du heb welî, du roj, deh-pazdeh selik, çar qapî, hezar û pênc sed rim, şeş sed û şêst û şeş awanî, sê mal

3.2.2.2.2. Rengdêrên Jimarîn Ên Rêzîn

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.2.2.2.3. Rengdêrên Jimarîn Ên Dabeşiyê

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.2.2.2.4. Rengdêrên Jimarîn Ên Kesrî

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.2.2.3. Rengdêrên Nediyar

hinek tûk,

3.2.2.4. Rengdêrên Pirsiyariyê

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.2.3. Ravekên Rengdêran

bircê bilind, çemeke mezin

3.2.4. Payeya Rengdêran

3.2.4.1. Payeya Asayî

tesirekî mezin,

3.2.4.2. Payeya Hevrûkirinê

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.2.4.3. Payeya Berz

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.2.5. Biçûkkirina Rengdêran

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.2.6. Sazbûna Rengdêran

3.2.6.1. Rengdêrên Xwerû

mezin, zana, xerab, helal, xweş, bilind, sivik, nermik, yek, du, sê, çar, şeş, sed

3.2.6.2. Rengdêrên Darîştî

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.2.6.3. Rengdêrên Hevedudanî

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

3.2.7. Rengdêrên Bi Lêkera ‘’Bûn’’ê Çê Dibin

Ev cure rengdêr nehatiye bikaranîn.

ENCAM

Di vê xebatê de me xwest ku bi saya çîrokên gelêrî (Çima çîrokên gelêrî? Bo ku karaktera devokan bi gelemperî di çîrokên gelêrî de veşartî ne.) yên herêma Silîva em rengdêrên ku di Kurmanciya Silîviyan de tên bikaranîn binasin. Ev xebat ji ber ku berfireh nîne û pirrî tiştan nahundirîne em nikarin angaşt bikin ku ji rengdêrên di çîrokên me de hatine tespîtkirin pê ve li herêma Silîva tu rengdêr bi tu teşeyî nayên bikaranîn. Her çend mijara me rengdêr be jî bo ku devoka Silîva bi awayekî şênber derkeve holê divê em li ser hêmanên hevokê yên din jî (bikaranîna wan) rawestin. (Karakterîstîka devokekê bes bi hêmanekî hevokê nayê tespîtkirin.)

Di her du çîrokên ku em li serê xebitî ne de 1245 bêje hatiye bikaranîn. Ji van bêjeyan hin jê bi eslê xwe Tirkî ne, hin jê jî bi Erebî ne. Mirov vê yekê dikare bi pirrî tiştan ve girê bide. (Perwerdehiya ne bi zimanê dayikê, polîtîka, danûstandina çandî û hwd.)

Bi gelemperî dema mirov li devoka Silîva dinihêre bikaranînên derasayî zêde dernakevin pêşberî mirov. Lê hin karakterîstîkên devokê jî bi hêsanî tê dîtin.

<u>Di çîrokan de (bo nasîna devoka Silîva) tiştine ku ji aliyê me ve hatine tespîtkirin ev in:</u>

- Rengdêrên nîşandanê yên tewandî vî, vê, wî, wê wek ewî, ewê, evî, evê tê bikaranîn.

  Mînak: ‘’ <u>Evî</u> lawikê radibe diçe.’’,‘’ <u>Ewê</u> pîrika hanê’’

- Di şûna rengdêrên nîşandanê de (vî, vê, wî, wê) bêjeya ‘’hanêka ‘’ bi gelemperî tê bikaranîn.

  Mînak: Qîza <u>hanêka</u>, lawikê <u>hanêka,</u> gêncê <u>hanêka</u>

- Li gor nirxandinê û mînakên ku hatine bijartin rengdêr pirranî xwerû tê bikaranîn. Sedema vê yekê lezgotina çîrokan e.

  Mînak: şehreke <u>pirr kevn</u>, bircê <u>bilind,</u> halekî <u>xerab.</u>

- Zayend car caran çewt tê bikaranîn.

Mînak: ‘’Bavê wî qîzika hanêka’’ (Di şûna ‘’wê’’ de wî hatiye bikaranîn.)

- Di her du çîrokan de jî vegotin bi yek demî nîne.

  Mînak: ‘’Destê wî li xilxalê ket.’’, ‘’Çemê Farqînê çemeke pirr mezin bûye.’’

- Cînava vegerok ‘’xwe’’ mîna ‘’xu’’ hatiye bikaranîn.

  Mînak: ‘’ Xatûn çû ser cesedê wî bala xu dayê.’’, ‘’ Destê xu berjêr anî.’’

- Bêjeyên Tirkî û Erebî pirr zêde nîn be jî tên bikaranîn.

  Mînak: Diya qîzikê firtûne çêkir.

  Go, mêrik merivekî çalişqan e,

  Ya rebbî, tu nusretê bidî.

- Qertafên tewangê yên nebinavkirî carinan çewt tê bikaranîn.

  Mînak: Rojkî derbas bû yek li berê sekinî. (yekjimar - nêr :ekî)

PÊVEK

1.CD

a) Proje

b) Qeyda dengên çîrokên ku li serê xebat hatiye kirin (sê qeyd) û sê wêne.

PIRTÛK

- "Silvan", Ana Britannica-XIX, Ana Yayıncılık, İstanbul, 1990
- Yrd. Doç. Dr.Güner Sağır, ''Bizans İmparatorlığu Döneminde Anadoluda Ermeni Yerleşimleri'', İstanbul, 2007
- Prof. Dr. Kadri Yıldırm, Kürtçe Dil Bilgisi, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin, 2012
- Sami Tan, Rêzimana Kurmancî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2011
- Mikail Bülbül & Bahoz Baran, Rêzimana Kurmancî, Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Amed, 2008
- Kamuran Bedirxan, Kolay Kürtçe, Doz Yayınları, İstanbul, 2000
- Celadet Ali Bedirxan & Roger Lescot, Kürtçe Gramer, Avesta Yayınları, İstanbul, 2009
- Qanatê Kurdo, Rêzimana Kurdî, - Kurmancî-Soranî, Nûbihar, Stenbol, 2013
- Abdullah Încekan, Ez Kurdî Hîndibim- Pratik Kürtçe Dersleri, Nûbihar, Stenbol, 2010
- Evliya Çelebi, Evliya Çelebi Seyahatnamesi, Sad. Tevfik Temelkuran – Necati Aktaş, Üçdal Neşriyat, İstanbul, 1986
- Çetin Taş, Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî, Dîwan, Stenbol, 2013

T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

SILÎVA (SİLVAN) AĞZINDA SIFATLARIN KULLANIMI

(ÖRNEK OLARAK SİLVAN AĞZINDAN BİR HİKÂYE ve BİR DESTAN VARYANTI)

Mehmet ÇALIŞCİ

2013084

Danışman

Öğr. Gör. Zülküf ERGÜN

Mardin 2017